Kurdisch

BELGEYA RAGİHANDİNÊ

Jibo Petromekirina parastina li hemberî KOVÎD-19 (**N**exweşiya **V**îrûsa **K**oronayê 201**9**)

- Bi petromên (waksen) mRNA -

Roj: 22ê Kanûna 2020î (Ev belgeya ragihandinê bi awayekî berdewam tê birojkirin)

Navê kesê ku tê waksînekirin: _____
(Ji kerema xwe bi tîpên mezin)

Roja Jidayîkbûnê: _____

KOVÎD-19 çî ye?

Vîrûsên Koronayê bi dehan sal e ku hatine naskirin. Vîrûsa Korona ya nû, SARS-Coronavirus-2 (SARS-CoV-2) ku hokara nexweşiya KOVÎD-19ê (Nexweşiya Vîrûsa Koronaya 2019) ye, ji dawiya sala 2019/2020 li seranserî cîhanê digere.

Nîşaneyên nasyar ên KOVÎD-19ê pêkhatî ji Kuxîna hişk, Ta (zêde ji 38 °C), Astengiya Bêhnkişandinê, her wiha jidestçûna demkî ya hesta Bêhnkirin û Çêjînê ye. Hesta giştî ya nexweşiyê hevrêdigel serêş û êşa leşî, êşa gewrî û avhatina ji bêvil jî tê wesifandin. Di hin babetan da, nexweş qala êşên mêde û rîviyan, werimîn û perçiftîna Multeheme (Bindehautentzündung) û "Lymphknotenschwellungen" dikin. Ziyana din di pergala eebî an reh û demaran, her wiha pêvajoyên demdirêj ên nexweşiyê pêkan e. Gerçî ku pêvajoya lawaz û hêdî ya nexweşiyê berbelav e û pirraniya nexweşan bi tam baş dibin, lê bi taybet derbarê pêvajoyên tundtir hevrê digel Zaturiyeyê ku dikare bibe sebeba mirinê bi riya kêşeya Pişikan, tirs heye.

Jibo pêşîlêgirtin ji nexweşiyê bi berçavgirtina qanûnên AHA + A + L (Parastina navbirê, paqijî, danîna Maskeya rojane, daxistina Bernameya Hişyarîdana Koronayê, Guherîna berdewam a hewa), waksînekirin anku Petromekirin baştirîn parastina mumkin li hemberî nexweşiyê pêk tîne.

Çi cûre petromek tê bikaranîn?

Petroma mRNA COVID-19 (Comirnaty®) ku li vir jê hatiye beshkirin, petromeke berhemhatî bi endazyariya genetîk û li gorî teknolojiyeke nû ye. Petromên din ên mRNA di halê testkirinê da ne, lê hîn nehatine piştrastkirin.

mRNA (Peyamgihana RNA an Peyamgihana Rîbonuklêîk Asîd (Ribonukleinsäure)) "Destûrkareke Çêkirinê" jibo her proteînekê di leşî da ye û nabe ku digel daneyên genetîkî yên mirov –DNA- şaş were zzanîn. Petroma mRNA li hemberî KOVÎD-19ê "Destûrkareke Çêkirinê" jibo pişkeke yekîne ji Vîrûsê (bi navê Proteîna" Spike") ye. Ev Proteîna" Spike" xwebixwe bêziyan e. Loma petrom înfekte nîne.

mRNA ya heyî di petromêda di Genoma (DNA) mirov da nayê danîn, belkî piştî çendn rojan di leşî da tê parçekirin. Piştra Proteîna Vîrûsê êdî berhem nayê.

Proteînên Spike ku piştî Waksînekirinê ji aliyê leşî va tên berhemanîn (Di şaneyên masûlkeyan di cihê petromekirinê û di hin şandeyên berevaniyê yên taybet da) ji aliyê pergala ewlehiya leşî va wek

proteînên derveyî tên naskirin ku di encama wê da şaneyên berevaniyê yên taybet çalak dibin: Antîbodî li dijî Vîrûsê û şaneyên berevaniyê çêdibe. Ev bersiveke elwehiyê ya parêzvan pêk tîne.

Jibo parastina pêwîst ji aliyê Waksînekirinê va, petrom divê ku du caran û bi navbira 3 hefteyan were lêdan. Ev petrom li masûlkeya jora Baskî va tê lêdan.

Waksînekirin çiqas bibandor e?

Parastina pêwîst ji aliyê Waksînekirinê 7 rojan piştî qonaxa 2 ji petromê destpê dibe. Li gorî zanista niha, derdora 95 kes ji 100 kesên waksînekirî li hemberî nexweşiyê tên parastin. Di dema niha da eva ku ev parastin çiqas dewam dike, diyar nine. Ji ber ku parastin derdem piştî waksînekirinê destpê nabe û ji bo hemî kesên waksînekirî li ber dest nîne, pêwîst e ku tevî waksînekirinê, xwe û derdora xwe bi berçavgirtina qanûnan biparêzî (Berçavgirtina navbira fîzîkî, paqijî, danîna maskeyê û guherîna hewayê odeyê).

Çi kesek bi taybet ji Waksînekirinê behreyê werdigire?

Petroma COVID-19-mRNA jibo kesên mezintir ji 16 salî rêpêdayî ye û armanca navîndem ev e ku em bikarin Waksînekirina li hemberî Kovîd-19ê jibo kesên mezintir ji 16 salî raber bikin. Tevî vê yekê, ji ber ku di destpêkê petrom bi qasî pêwîst jibo dabînkirina giştan li ber dest nîne, waksînekiria kesinan divê bikeve yekemeyetiyê ku li ber rîska jora pêvajoya tund an kujer a KOVÎD-19 (an bi taybet kesên temendirêj) da ne, an kessên ku ji ber karê xwe bi taybet li ber xetera tûşbûna bi SARS-CoV-2 ne an ji ber karê xwe digel kesên li ber xetera KOVÎD-19ê di têkiliyê da ne. Ev nirxandina STIKO'yê (Komîsiyona hertimî ya Waksînekirinê li Enistîtûya Robert Koch) yeku bi berçavgirtina rapora rewşê bi awayê hevpar digel Konseya exlaqê ya Almanyayê (Leopoldina) hatiye amadekirin.

Çi kes divê neyên petromekirin?

Zarok û xortên bin 16 salî ku di dema niha da petrom jibo wan rêpêdayî nîne, nabe ku bên waksînekirin. Ji ber ku hîn bi qasê têrê tecrube û ezmûn tune, waksînekirin di heyama Ducanîbûn û Şîrdayînê da niha tenê bi nirxandina kesane ya asta Rîsk-Sûdê tê tewsiyekirin.

Here kesek ku tûşî nexweşiyeke giran bi taya zêdetir ji 38,5°C e, tenê piştî baştirbûnê divê were waksînekirin. Tevî vê yekê, qerisîn (zekem) an Taya hinekî zêde ya leşî (bin 38,5°C) hegerek jibo paşdaxistina waksînekirinê nîne. Heke hestiyariya te ya zêde derheqê pişkên Petromê heye, nabe ku Petromê lêdî: Ji kerema xwe beriya Waksînekirinê, heke Alerjiya te heye, ji bijîêşkê Waksînekirinê ra bibêje.

Kesên ku pêştir tûşbûna wan bi Vîrûsa nû ya Koronayê hatiye piştrastkirin, di destpêkê da neçar nînin ku bên waksînekirin, lê ev yek bi wateya nebûna hewcetiya bi Waksînekirin anku petromekirinê nîne.

Pêş û piştî Waksînekirinê divê ez çi karekî bikim?

Heke piştî waksînekirina pêşîn an derzîlêdaneke din bêhiş bûyî an heke potensiyelaa te jibo Alerjiya bilez heye, ji kerema x we vê yekê beriya pêkanîn aWaksînekirinê ji Bijîşkê Waksînekirinê ra bibêje. Piştra ew dikare piştî Waksînekirinê zêdetir te bixe bin çavdêriyê.

Ji Waksînekirinên din divê herîkêm 14 roj derbas bûbin.

Piştî Waksînekirinê, hewce nake ku bi awayekî taybet xwe biparêzî.

Heke piştî Waksînekirinê Ta an Êş qewimî (Binêre: "Çi bertekên petromê renge piştî Waksînekirinê biqewimin?"), dikarî dermanên êşbir/Kêmkerên êşê (wek mînak Paracetamol) bi kar bînî. Bijîşkê malbatê dikare di vî warî da şêwirînê bide te.

Çi bertekên petromê renge piştî Waksînekirinê biqewimin?

Piştî waksînekirina bi Petroma mRNA (Comirnaty®), bertekên pişkî û giştî dikarin wek pevçûna leşî digel Petromê hebin. Ev bertek bi giştî di heyama 2 rojan piştî Waksînekirinê diqewimin û kêmtir zêde ji 1 heta 2 rojan dirêj dibin.

Zêdetirîn bertekên ragihandî yên waksenê (petrom) di heyama dîtina dumehî heta aniha da pêkhatî ji êşa di cihê derzîlêdanê da (zêde ji sedî 80), westiyan (zêde ji sedî 60), serêş û hejiyan (zêde ji sedî 30), Êşa movikan (zêde ji sedî 20), Ta (germaya leşî) û werimîna cihê derzîlêdanê (zêde ji sedî 10). Pirranî (navbera sedî 1 heta sedî 10) dilrabûn û sorbûna cihê derzîlêdanê pêk tê. Carinan (navbera sedî 0.1 heta sedî 1) werimîna kulbirînên "Lymphknotenschwellungen", Bêxewî, êşa bask an pê, nerihetî û xurîna cihê derzîlêdanê heye.

Pirraniya bertekên vedîtî di kesên temendirêj da heta radeyekê kêmtir ji kesên xort û cewan e. Bertekên Waksînekirinê bi giştî hindik an navgîn in û piştî Waksînekirina duyem heta radeyekê zêdetir diqewimin.

Gelo dûhatên Waksînekirinê pêkan in?

Dûhatên Waksînekirinê, dûhatên petrom anjî Petromê ne ku joratir ji asta xwezayî ya berteka Petromê ne û bandora nerênî li sser tendurustiya kesê waksînekirî datînin.
Di ceribandinên kilînî yên beriya dayîna destûrê, piştî destûrdana waksena mRNA ku li vir hat behskirin, 4 babet (navbera sedî 0.1 û sedî 0.01) felecbûna giran hat dîtin. Eva ku gelo ev babet têkildarî waksînekirinê ne an na, zêdetir di halê vekolandinê da ne. Tu dûhateke ciddî ya din di lêkolînên kilînîkî da nehat dîtin. Ji ddema destpêbûna waksînekirinê, bertekên hestyariya zêde di babetên kêmdîtî da hatine ragihandin. Ev babet hinekî piştî waksînekirinê qewimîne û hewcetîya wan bi dermankirinê hebû. Di esasa da, weke hemî waksenan, dûhatin din jî dibe ku biqewimin.

Heke nîşaneyên piştî waksînekirinê biqewimin ku wêdatir ji bertekên demkî yên pişkî an giştî yên navbirî li jorê bin, dê bijîşkê malbatê jibo şêwirînê li ber destê we be. Heke kêşeyên giran qewimîn, derdem li dû dermankirinê be.

Her wiha tu dikarî dûhatên pêra bixwe ragihînî: https://nebenwirkungen.bund.de

Ji bilî vê belgeya ragihandinê, bijîşkê waksînekirina te, dê bi gotûbêjê te haydar bike.

Têbînî:

_____	_____
Wajoya Bijîşkê waksînekirinê	Wajoya kesê ku tê waksînekirin (an her wiha nûnerê qanûnî)

Enistîtûya Paul-Ehrlich (PEI) di halê pêkanîna rapirsînekê derbarê tehemilkirina petroman jibo parastina li hemberî Vîrûsa Koronayê (SARS-CoV-2) ya nû bibikaranîna App'a ser jîrefonan (SmartPhone) ya SafeVac 2.0 ye. Rapirsîn dilxwazî ye.

Tu dikarî lêzanînên zêdetir derbrê KOVÎD-19êû waksînekirina KOVÎD-19ê di malperên jêrê da bibînî:
https://www.zusammengegencorona.de/informieren/informationen-zum-impfen/

https://www.bzga.de/

www.rki.de/covid-19-impfen

https://www.pei.de/DE/newsroom/dossier/coronavirus/coronavirus-inhalt.html

Çapa 1 Versiyona 002 (Tarîxa 22ê Kanûna 2020î)

Jêstandina Berpirsiyariyê

Versiyona sereke (06/2018) ya Belgeya Ragihandinê jibo Enistîtûya "Robert-Koch" bi destûra dostane ya Xaça Kesk a Almanyayê (Civata Tomarbûyî) bi hevkariya digel Enistîtûya Robert-Koch hatiye wergerandin. Ya esasa nivîsa almanî ye; heke venihêrînek di versiyona sereke da pêk were, tu berpirsiyariyek derheqê xetayên wergerandinê an têkildarbûna wergera niha nayê pejirandin.

Kurdisch

Raboriya nexweş derbarê Waksînekirin li hemberî KOVÎD-19ê - Bi Petroma mRNA

1. Gelo te* di dema niha da nexweşiya giran digel Tayê heye?

0 Belê 0 Na

2. Gelo tu* tûşî nexweşiyên demdirêj an nivîşkaniya êminiyê yî? (wek mînak bi riya Kîmiya dermanî an dermanên din)?

0 Belê 0 Na

Heke bersiva te Belê ye, çi cûreyek_____

3. Gelo te* kêşeya rawestana Xwînê heye an dermanê Rînker û zelalkera xwînê bi kar tînî?

0 Belê 0 Na

4. Gelo te* Alerjiyeke (Hestiyarî) naskirî heye?

0 Belê 0 Na

Heke bersiva te Belê ye, çi cûreyek_____

5. Gelo *piştî waksînekirina pêşîn, te* nîşaneyên alerjîk, taya zêde, jixweçûn an bertekên din ên ne-asayî hebûne?

0 Belê 0 Na

Heke bersiva te Belê ye, çi cûreyek_____

6. Di jinên di temenê Ducanîbûnê da: Gelo tu di dema niha da Ducanî yî an şîr didî*?

0 Belê 0 Na

7. Gelo tu* di heyama 14 rojên bihurî da hatiyî waksînekirin?

0 Belê 0 Na

* Heke pêwîst e bila ji aliyê nûnerê qanûnî va were bersivandin

Kurdisch

Razîname derbarê Waksînekirin li hemberî KOVÎD-19ê – Bi petroma mRNA

Navê kesê/kesa ku tê waksînekirin (Paşnav, nav):

_____

Roja Jidayîkbûnê: _____

Navnîşan: _____

Ez naveroka Belgeya Ragihandinê têgihîştim û derfeta min hebû ku digel Bijîşkê Waksînekirinê yê xwe gotûbêjeke hûr û kûr pêk bînim.

- o Pirseke min a din tune.
- o Ez derheqê waksînekirina pêşniyarî li hemberî KOVÎD-19ê bi petroma mRNA razî me.
- o Ez naxwazim bêm waksînekirin.
- o Ez aşkira dev ji şêwirêna ragihandina bijîşkiyê berdidim.

Têbînî:

Cih, Roj: _____

_____ _____

Wajoya kesê/kesa ku tê waksînekirin
An her wiha nûnerê qanûnî
(Qeyûm, Qeyûmê qanûnî)

Wajoya Bijîşk